# Alîkariya zarok û ciwanên di bin bûyerên trawmatîk bûne biser kevin

Bûyerên dijwar ên mîna şîdeta civakê, bi hêz û xemgînî ne. Gelek mirov dikarin bibin xwedî rîaksiyonên hestewar an jî fîzîkî yên mîna xemgînî, şoq, tirs, hêrs, tevlîhevî û westanê. Îro û di hefteyên pêş de, dibe ku hûn û zarokê we ji gelek aliyan ve bandor li bibin, ji ber ku her kes dê bertekên cuda nîşan bide. Hestên tengaviyê normal in û piştî bûyereke trawmatîk dibe çêbibin.

## Dê û bav û çavdêr dikarin çi bikin?

çavdêr û endamên malbatê, bi afirandina derdoreke ewle û piştevan, bi qasî ku pêkan be aram bimînin û stresan kêm bikin dikarin bibin alîkar. Zarok û ciwan divê bizanibin ku endamên malbata wan ji wan hez dikin û ji bo xwedîkirina wan çi ji destê wan bê ew ê bikin. zarokan piştrast bikin ku ew di nava ewlehiyê de ne û ji bo afirandina hesta ewlehiyê bibin alîkar.

## bi awayekî durist û vekirî behsa bûyerê bikin û bila li gorî temenekî guncaw be

- Tiştên rast lê hêsan pêşkêş bikin, ên ku alî wan bikin ku ew fehm bikin ka rastî çi ye û xeyal çi ye. Hewce nake ku zêde hûrgilîyan parve bikin.
- Ji bo pirsên wan bersivên hêsan û şênber bidin zarokan. Heger hûn nikaribin bersivê bidin pirsê, baş e ku mirov bibêje, ''ez nizanim çawa bibersivînim'', ''dibe ku em qet bersiva vê nizanin'', ''belkî em dikarin kesekî bibînin ku alîkarîya me bikin''.
- Bila zarok bizanibin ku kengî amade bin dikarin biaxivin, di her kêlî û demê de pirseke wan heye bipirsin. Zarok jî wekî mezinan bi leza xwe di şînê de tevdigerin.

### Ji zarok û ciwanan re derfetan peyda bikin da ku hestên xwe bînin ziman

- Zarok û ciwanan teşwîq bikin ku li ser fikir û hestên xwe biaxivin -lê zorê li wan nekin. Dibe ku ji bo zarokên biçûk hewcehîya te bi vekirina sohbetê hebe. Alîkariya zarok û ciwanan bikin ku peyvan bidin hîskirin.
- Bila li ser bûyerê û hestên xwe biaxivin, binivîsin an jî wêneyan bikişînin.
- Xemgînî an hestên din ên ku zarokê we îfade dike, pejirand, wan teşwîq bikin ku werin ba we.

### Raportên nûçeyên yên dubare dibin di derbarê bûyerên trawmatîk de sînordar bikin

- Mezin dikarin zarokên biçûk ji bûyerên trawmatîk biparêzin, nehêlin ku nûçeyên medyayê bibînin an jî nebihîzin an jî li ser bûyeran guhdarîya sohbetên mezinan bikin.
- Eger zarokên mezin li çîrokên medyayê yên bûyerên bi êş temaşe dikin, ya herî baş ew e ku mirov bi wan re temaşe bike.

### zarokan ewle bikin û bersivê bidin pêwîstiyên xwe yên ji bo hestbiewlekirinê

- Bila zarokên biçûk di odeya we de (ji bo demeke kurt) rakevin an jî heger di xewê de zehmetiyê dikişînin bila bi ronkahiyê razên.
- Hewl bidin ku bi rutbeyên asayî yên wekî derveyî çalakîyên dibistanê, xwarina şîvê bi hev re û dema malbatê ve girêdayî bimînin.
- Alîkariya wan bikin ku ew ji xwe re hin biryaran bistînin, wekî hilbijartina xwarinan an jî hilbijartina cilên xwe.

### Li rîaksiyonên gengaz ên stresê binihêrin

- Li nîşaneyên stresê yên di xwe û yên din de baldar bin û heger tişt zêde bibin li piştgiriyeke zêde bigerin. Di nava vê de qala hestên xwe bikin.
- Di reftar, axaftin, bikaranîna ziman an jî hestên xurt de guhartinên ji nişka ve balê bikişînin.
- Eger pirsgirêkên nû bi pêş bikevin, bi taybetî eger ji çend hefteyan zêdetir semptomên li jêr rû bidin, bi peydakerê tenduristiyê re têkilî daynin:
  - Dil bi lez lêdikev pêşbazî û xwêdanê
  - Bi hêsanî distirê
  - Bê hest bimîne
  - Pir xemgîn be an jî têkeve depresyonê
  - Buyeran bibîrbîn (ji nû ve zindîkirina bûyerê).

## Xizmetên Alîkariyê

Heger hûn ji bo xwe an jî kesekî din bifikar bin, xwe bigihînin yek ji xetên alîkarîyê.

**Xeta Tendurustiya Derûnî (Mental Health Line): 1800 011 511**

Xeta telefonê ya 24/7 ku ji hêla pisporên tendirûstîya derûnî ve tê xebitandin dikare mirovan ber bi xizmetên desteka herêmî ve bibe.

**Xeta Alîkariya Zarokan (Kids Helpline): 1800 55 1800**

Xizmeteke bêpere, nepenî ku ji bo zarok û ciwanan şêwirmendiya onlyin an jî li seer telîfonê pêşkêş dike.

**Xeta jiyanê (Lifeline): 13 11 14**

Ji bo mirovên krîz an jî tengaviya xwekuştinê rû didin, desteka 24 saetan a krîzê.

**Headspace: 1800 650 890**

Xizmeta alîkariya derûnî ya herêmî ji bo ciwanan û malbatên wan, bi armanca destwerdana zû.

**13YARN: 13 92 76**

Piştgiriya şêwirmendiya ya jo krîzan ya bêpare ji bo gelên Aborjînî û Girava Torres Strît.

**Xeta ji bo mêran (MensLine): 1300 78 99 78**

Alîkariya şêwirmendiya telefonê 7/24 ji bo mêrên ku xema wan li ser tendurustiya derûnî, têkilî, stres û tendirûstiyê heye.

**Xeta Tenduristiya Derûnî ya Navçandî (Transcultural Mental Health Line): 1800 648 911**

Xeta telîfonê ya ji Duşemê heta Înê saet di navbera 09.00 û 16.30 de ji bo piştgirîdayîna mirovên li NSW'ê ji civakên cuda yên çandî û zimanî hatine.

**Xizmeta wergêran ya li ser telîfonê (Telephone interpreting service (TIS)): 131 450**

Heger pêdivîya we bi alîkarîya wergêran hebe telîfonî TIS bikin û bibêjin ku pêdivîya we bi kîjan zimanî û jimarê heye. Ji bo alîkarîya axaftina we, operator dê wergêrekî li ser xetê bistîne.